# LÊOPOLD
Çîrok

Nivîskar: **Lars Kilinting**
Werger: **Xelîl Duhokî**

Di naverasta daristanekê de, di bin bilindtirîn dar de, Lêopoldî paldida û xewn didîtin.
Lêopold şîrekî gelek pîr bû. Pîr û çavkiz, eger rastîyê bêjîn, guhên wî jî di giran bibûn.
Çinku Lêopold gelekî pîr bû, êdî pir tiştên kevin li bîr bûn. Wî gelek caran hizir dikir ku berê yê çawan bû, pêşî ku pîr û çavkiz bibe. Di wextê xwe de, ew tiştekî din bû, wî hizir dikir. Wî demî ez dirindeyê daristana bûm. Wî demî xurt, bihêz û mîna bay bi lez bûm. Dem her ew bû!
Lê niha ew ne xurt, ne bihêz û ne jî mîna bay bi lez e. Rêyên nav daristanê jî, ji daran pirbûne. Candarên din wasan hizir dikirin ku Lêopoldî, çi hêvî di jiyanê de nemayîne. Wan ne dizanî, bikenin yan jî bigirîn, dema ew didîtin ku xwarûvîç li dor daran dizivirî.
Carina Lêopoldî digel şitledaran, dar û beran qise dikir. Wî wesan hizir dikir ku digel Meymûn, Berazekûvî yan jî candarên din dipeyive. Bi wî rengî çavên wî kiz bûn û çinku guhên wî jî pîçekê di giran bûn, êdî ji hindê dilteng ne dibû , dema çi bersiv negirtibana.
Candarên din bi Lêopoldî dikenîyan, dema didîtin ku ew bi xeletî dest ji bo her tiştî dibe. Birabiçûkê meymûnê ji hemûyan pêtir pê dikenîya. Ew hind pê dikenîya ku carina bêhnçikyayî dibû, dema didî ku Lêopold xwarûvîç diçû yan jî karekê şêtane dikir. Çinku carina wî karên şêtane dikirin…
Her hizrê di hindê de bike, dema ew ketiye ser neynokên tûjên pên Hêştirmayê Helbet bweriya Lêopoldî ew bû ku ew tak û çiqên daran e.
Yan dema ku wî tevaya malbata Pîtonî, ji ser warê wî derkirî. Bawerîya wî ew bû ku hemû tak û çiqên darane li ser xweşcihê razana wî bûne gilêş û zibil.
Her basî hindê nekin, dema ji bo ku bixewe, wî xwe li ser piştа Hespêavî dirêjkirî. Li cem Lêopoldî, ew xweştirîn kevire ku dîtî. Lê Hespêavî pir xeyidî.
Lêopold berdewam li wan nava, di nav şitl û daran de digerîya, di wî demî de jî, candarên din jê bêzar û dilteng dibûn. Rojekê gehiştine bawerîyê ku divê ev çende bes be, lewre Meymûnê got:
- Nabe şêrekê weha bêhêz û sist di nav me de hebe. Ew hemî daristanê ditirsîne.
- Bi rastî divê şêr bi başî bibîne, Sekretêrêbalindan got. Çi mifa di şêrekê nîvkore de nîne.
- Divê şêr baş denga bibihîze.Hêştirmayê got.
- Çi mifa di şêrekê nîvkerr de nîne.
- Nabe şêr gelekî pîr be. Simsiyarkî got. Di ser hindê re jî, ew berdewam li ser van rêya ye. Lêopold hindek ji wan alîya dûrket. Li bin sihekê palket û di xew çû. Ew têgehişt ku candarên din basî wî dikin û dizanî wan çi got. Di wî demî de, bêhna xwe helkêşa û hizir kir: Ji bo ku peya têbigehe, pêwîst nake guh li hemû tiştan bibe.
Rojekê rûdaneka pir bi tirs, di nav daristanê de rû da. Meymûn bi lez û tirs hat, her weku daristan hatibe topbaran kirin. Boblat û perîşanî, wî hawar kir. Boblat û perîşanî! Candarên din li dor Meymûnê civiyan ji bo ku bizanin çi rûda ye. Heta ku Lêopoldî jî guh li qêjî û hawara Meymûnê bû.
- Wan birabiçûkê min girt, meymûnê dilorand. Du zelam ji baxçê candaran hatine vêre, ji bo ku candaran bigirin. Niha jî birabiçûkê min girtin!
Hemû ji tirs û sehma lalotebûn. Meymûn li ser peyivîna xwe berdewam bû:
- Nêçîrvanan bi dilxweşî digot ku wan divê candarekê mezintir û tirsinaktir bigirin, lê niha meymûneka biçûk jî baş e ta ku yeka baştir bigirîn. Paşî birabiçûkê min di nav tirumbêla nêçîrê de girêdan. Ez çi bikim? Divê hûn alîkariya min bikin! Hemû bi tevayî bêdeng bûn. Hizra hemûyan ew bû ku eve bêwijdanî ye. Lê hindî hizir kirin, çi rê ji bo rizgarkirina birabiçûkê Meymûnê nedîtin.
Piştî bîstekê, Lêopoldî xwe avête pêşiyê û got:
- Ew dikarin li şûna wî, min bibin. Hemûyan temaşayî wî şêrê pîr kir. - Min digel hindê jî, hizir kirîye ku ez gelek pîr bûme ku dest ji hemû tiştî berdim, wî got. Di baxçê candaran de, ez li ser rê ya jî namînim. Her nebe rojê du danên xwarinê jî wê bidine min. Min bihîstîye.
Hizreka baş e! Eger nêçîrvanan şêrek bigirtana, bêguman ew li şûna wî dibir. Hemûyan biryar dan ku biçine çerwanê nav daristanê, cihê ku birabiçûkê Meymûnê lê girtî.
Dema candar di nav daristanê de diçûn, hizir kirin. Wan şerim ji wan qisan dikir yên ku berê digotine Lêopoldî. Belê; piştî hemû tiştan, wan hest bi xem û azarê dikir ku Lêopold wan bihêle. Lêopold jî, pîçekê xemgîn bû. Dema ew di nav giyayê kesk re derbaz bû, malavayî ji daristanê kir. Wî wesan hest dikir ku evro pêtir pîr û bêçare ye.
Hîngê axînk radihêlan û bi şerpezeyî hizir dikir: Xweşbû eger wan birabiçûkê Meymûnê berdaba! Hindik mabû ku bigehine cihê çerwanî.

Nêçîrvanan yekser Lêopold dît.
- Temaşake eve şêrek e, wan got. Bêguman gelekî pîr e, lê bi kêrî hindê tê ku di baxçê candaran de, nîşa xelkê bidîn. Werin da girê bidîn.
Lê di wê gavê de, tiştek rû da ku her weku di berê de jî, çendîn caran rû dabe! Lêopoldî xwe bi wî rengî nedîtibû. Wî berpên xwe nedîtibûn, pê wî rast kete ser dirkekê tûj, dirkekê xirab bû! Êş û azareka giran jê hat. Paşî Lêopoldî wesan xwe nîşan da ku yê ji hemîyan xurtir û zîrektir e di nav daristanê de…
- Wî nirand û li harênê da!
Kesê berî hîngê guh li harêneka wesan ne bibû. Ne berê û ne paşî jî. Her weku bahozeka bi hêz bû ku bi ser tirumbêl û çerwanî de girtî.
Nêçîrvan gelek tirsîyan, siwarbûn û bi rê ya xwe de çûn, her weku ji ber tozê gêj bibûn û careka din nehatine ve.
Hespêavî, Hêştirmayê û Sekreterêbalindan, arezû kirin ku bizanin ka çi rûda ye, marê Pîton çi tê negehişt, Simsiyark sewdaser bibû, Meymûnê birabiçûkê xwe dît û Berazekûvî alîkarîya Lêopoldî kir û dirik ji pê wî derxist.
Îca piştî hîngê kesê negot ku Lêopold li ser rêya ketîye. Berovajî! Hemûyan wesan hizir dikir ku ew xurt û zîrektirîn pîreşêrê cîhanê ye. Birabiçûkê Meymûnê, cardin dest bi pêkenînê kir. Lê niha ew bi wan hemû kurteçîrokan dikene yên ku Lêopold êvaran, berî razanê, jê re vedigêre.

********************************